

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 43

**HÊJE MÊJE
EMÊ NUHA ÇEND
ÇÎROK Û MESELÊN XWE
JI WE RE BÊJIN**

Kulîlk

Sal: 1990

Ji Redaksiyona Kovara Kulîlk re.

Hevalêd delal !

Berî gişî ez koma redaksiyona Kulîlkê û tema-miya kurdên Swêdê re selamên xwe yên germ dişînim.

Ez kurdekî Sovyetê me. Li Repoblîka Qazaxistanê dimînim. Di sala 1937 -an de em kurdên Qafkazê Surgûnî Qazaxistanê kirin. Ez bi xwe 71 salî me. Min xwendina xwe ya bilind di sala 1945 -an de dest anî û 45 salan min di mektebê qazaxa û urisa de ders da. Niha ez pensiyon im.

10 zarokên min hene. 7 kur in û 3 qîz in. Gişa xwendina bilind dest anînin. Di xebatên cûrecûre de dixebitin. Giş zewicînin û zarê wan hene. Bûk û zavên min giş kurmanc in.

Ez bi xwe li gundê Qewqeculaxê dimînim. Gundiyên wê tev kurmanc in. Gund 150 mal in. Li gund dibistana 10 sale heye. Mamoste tev kurmanc in. Heftê du caran dersên kurmancî didin.

Di sala 1984 -an de, di kovara Kulîlkê hejmara 15 de bi navê "Kurdistan" helbestek min derket. Ji Erîvanê Tîmûrê Xelîl ji we re şandibû.

Ez dixwazim bibim abonê kovara we. Ez ê çawa bibim abone, ji min re bişînin.

Bi silavên germ.

Mûsa ê Temo

MIRÎYÊ DEH PERA

Berhevkar: **Bavê Hêvî**

Deriyê hewşê ji ber kirin û Hemo ew bi werîsekî li pişta Suphî baş şidand. Çêlek berada û ji birakê xwe re got:

- Rêya te vekirî be û li çêlekê baş miqate be.

Yê bajarî derî li piştê û da dû çêlekê. Lê, rebeno dikir û nedikir nedigîhaştê wê. Çêlekê wek her gav berê xwe da rêya gundan û belengazê Suphî jî her li dû wê baz dida. Pir derbas nebû, feqîro ji hal de ket. Ji tirsê ku çêlekê wenda neke nekarîbû ji dû wê jî vegere. Wê gavê hêdî hêdî hişê wî hat serê wî, ku bê birakê wî çi aniye serê wî.

Piştî Suphî da ser oxura xwe, Hemo bi kêfek mezin berê xwe da êxur, da ku ew jî wek yê bajarî hinekî "tiraliyê" bike. Gava paldana ber siya êxur jî dihat bîra wî, devê wî diçû paş guhê wî. Bi vê heviyê gihaşt ber devê deriyê êxur. Dema ku serê xwe dirêjî hundir kir, ruyê wî pê re hat guherîtin, çongê wî lerizî û heft xwezî bi karê xwe yê do anî. Lê ji bêçaretî wî jî selika xwe da

ber rêxê û kişand. Bikşîne û hey bikşîne...Heta êvarî pişta wî kete ber wî û di ber xwe de jî her weha digot:

- Weleh, Suphî efendî rast digot. Maşallah...Min li ber siya êxur xweş palda.

Ber bi êvarî Hecî Hadî ji odê daket hewşê û lê hay bû, ku deriyê hewşê ne li ber e. Bi awakî hêrs û şaşmayî ji Hemo pirsî:

- Lawo Hemo, ma ka deriyê hewşa me ?

Hîn Hemo difikirî, ku çi bersîvê bide, yê bajarî derî li pişt û ziman ji dev kişyayî bi dû çêlekê de kete hewşê. Hecî nema zanî-bû bê çi qewimî ye û ji Suphî pirsî:


- Kuro, ma tu dîn bû ye, ev çi deriye li pişta te ?

Yê bajarî ji hêrsa peyv nedigîhand hevdu û bi zorê ev bersîv da:

- Axa, ez xulam, ji xwe îmana min hatiye serê bêvila min. Çêleka te ez gund bi gund gerandim. Ez bûm şadîkê şivan, gavan û bêrîvanên çolê. Hevalê min mala min xerab kir. Mêrg û kaniyên wî serê wî bixwe.

Mêrik barê xwe ji pişta xwe danî, çêlek bir êxur û girêda. Hatin hundir. Yê bajarî ta girt û xwe li ser kulavê ode dirêj kir. Yê kurmanc ji Hecî re got:

- Heyran tu dibînî ku hevalê min nexweş e. Ez pir ditirsim ku ev mêrik li vir di nav le-



pê me de bimre. Ya baş, tu perekê me bidî me û em ê sibê heta nîvro jî karê te bikin. Dûre, eger tu destûra me bidî, ez ê birakê xwe bibim.

Hecî Hadî got:

- Karê we serê we bixwe. Ji we re du quriş û nîv ê we û ne pêwîst e, ku hûn heta nîvro jî bixebitin. Destûra we bi we re û sibê ez we li van dera nebînim.


Herdu hevalan serê sibê ji Salikê derketin. Bi rêv de perê xwe li hev parê kirin. Her yekî Qurişek girt. Lê nîv quriş di navparê de ma. Ji ber ku perê hûr tunebû, her yekî nedikarîbû deh perê xwe bigirta. Suphî got:

- Birako, gava em bighêjin bajêr, ez ê vî nîv qurişî hûr bikim û deh pera bidim te. Bi vî awayî li hevdu kirin û rêya xwe do mandin. Bi rê de li bîrekê rast hatin. Li ber bîrê sekinîn û yê kurmanc got:

- Birako, baş bû ku em li vê bîrê rast hatin. Ji tîna qirika me zuha bûbû. Divê yek ji me dakeve binê bîrê.

Yê bajarî got:

- Weleh, ez newêrim dakevim binê bîrê. Ka tu pişta xwe veke. Em ê bişt û desmalên xwe bi hevdu ve girêdin û ez ê te daxim




binê bîre. Tu têr vexwe, kumê xwe jî ji minre tije bike û dûre ez ê te bikşînîm jor. Destmal û piştên xwe bi ser hev vekirin û Hemo xwe bera binê bîrê da. Dema ew gîhişt binê bîrê, çî bibîne; Sindoqek tije zêr û mecîdî di binê bîrê de ye. Hemo tîbûna xwe ji bîr kir, rahişt sindoqê û ji hevalê xwe re got:

- Birako, em tê de man. Min sindoqek tije zêr û mecîdî dît. De min zû bikşîne.


Gava Hemo bi rûkarê devê bîrê ket, yê bajarî dada sindoqê û hevalê xwe bi şûnd de bera binê bîrê da. Hemo di dilê xwe de got: "Te dît min bi destên xwe çî anî serê xwe." Bi zahmetiyek mezin ji bîrê derket. Roj çûbû ava. Dinya hedî hêdî tarî dibû. Li derdora xwe nerî, kesek nedît. Ji xwe re got: "Ya baş ew e, ku ez wek kera bizirim, hela bê ev segbav li min venagere." û wek kera dest bi zirandinê kir.

Yê bajarî got: "Weleh ez betilîmim. Wa ye kerek tê. Ez ê hem lê siwarimê û hem jî sindoqa xwe li wê bikim. Wexta ku nêzîkî hevdu bûn, lênerî ku birakê wî ye.

(Dumahîk heye)




MUSABAQA PAQIJKIRINA DIRANAN



Eger musabaqak
pakijkirina diranan çê biba; wê
Maxî û Baxî bi serketan.

Eger em bixwazin
diranên me jî,
wek yên Maxî û
Baxî xweşik û bê-
êş bin; divê em
Li wan bas xwedî
derkevin.





Paqijkirina diranan, ne hew ji bo
xweşikbûna wan in. Gava diran
xera bibe; tesîra xwe Li ser
organên din jî dike.



Gava em bas
Li wan nenerin,
wê êş di wan
keve û divê
em herin ba
dكتورê dirana.



Hun dikarin, xwe Li hember
ew tiştên ku
diranan xera
dike, biparêzin.
Ji bo vî tiştî, ka
em Li Maxî û Baxî
guhdar bikin!





ZIVISTAN Û GUHERÂNDINÂ DI HEYWANAN DE

Dema ku hewa dest bi sarbûnê dike, hem hejmar û hem jî cûrên heywanan kêr dibin. Ji ber ku bi sarbûna hewê re, koçkirin tê rojevê. Heywanên ku nema dikare li hember guhertina demsalê debar bike, li ser barkirinê diponijin. Legleg, hehecîk, bilbil, quling û hwd ber bi welatên germ difirin. Hêlînên wan vala dimînin. Şûna wan, heta ku ew paş de vedigerin, xuya ye. Kîso, mar, marmarok û heywanên wek gêrîkan dikevin xewa zivistanê. Mêş û pinpînîk kêr dibin. Ewr ruyê xwe tîrş dike û xweza (tabîat) haziriya kirasekî nuh dike. Rengê wê ber bi guhertinê diçe. Li pisîk û kûçikên li mala we heye, baş bînerin; pirça wan hinekî dirêj dibe. Mirîşk dibin xwediyên perîkê nuh. Perîk û pirç, heywanan ji sermê diparêzin.

MEYWE




kurdi	tirkî	fransîzi	ingilîzi
sêv	elma	pomme	apple
porteqal	portakal	orange	orange
hirmê	armut	poire	pear
hêjir	incir	figue	fig
hinar	nar	grenade	pomegranate
zebeş, şûti	karpuz	pastèque	watermelon
xox	şeftali	pêche	peach
tiri	üzüm	raisin	grapes
kelek, gundor, petêx			
qawin, qîre	kavun	melon	melon
arûng, zerdele			
qeysi, mişmiş	kaysî	abricot	apricot
tûtfrengî	çilek	fraise	strawberry
tû	dut	mûre	blackberry
behiv	badem	amende	almond
gûz	ceviz	noix	walnut
gêlaz, qeresî	kiraz	cerise	cherry
wişne	vişne	griotte	morello cherry
biyok, bih	ayva	coing	quince
alûçe	yeşil erik	mirabelle	plum
incas, tulûreş	kara erik	prune	plum
limon	limon	citron	lemon
mûz	muz	banane	banana
mandarin,	mandalin	mandarine,	mandarin,
klemantîn		clémentine	clémentine
fistiş, piste	fistiş	pistache	pistachio
findiş, bindeq	findiş	noisette	hazelnut
bitim	bitim		
kezwan, şinok	menengûç		
givij	akdiken	aubépine	hawthorn
xurme, qesp	hurma	datte	date
hembelaz, xatûnok			
dendûreşk	bögürtlen	mûre sauvage	bramble
anas	anas	anas	pine apple
şekok, girsik			
tihok, tawik	dağdağan		
belût	palamut	gland	acorn
kestane	kestane	chataigne	chestnut
tereşî	nektarin	nectarine	nectarin
zeytûn	zeytin	olive	olive

Mijûlî

Du şîrîkê hev henin. Ew dixwazin dimsa xwe li hev parê bikin. Lê, tu qapan û mêzîn li cem wan nîne. Hew sê tenekên bi mezinbûnê ne wek hev henin. Teneka A yê şûna 10 kg ye. Teneka B yê şûna 7 kg ye û ya C yê şûna 3 kg ye. Teneka A tije dims e.

Gelo, hun dikarin bi alîkariya her sê tenekan vê dimsa di teneka A de, li her du şîrîkan parê bikin, ku yer yekî 5 kg para wî bikeve?


(Ev pîrsa di nav gel de bi awên cûr-becûr tê gotin û bersîva wê di rûpelê 25 de ye.)




EZ KÎ ME ?



Du lingên min hene.
Ez difirim û dixwînim.
Ez kî me ?





<u>kurdî</u>	<u>tirkî</u>	<u>fransizî</u>	<u>îngilizî</u>
52-63. PÊ pêçî	AYAK ayak parmağı	PIED orteil	FOOT toe
52. pêçiya beranê, pêçiya mezin	ayak paş parmağı	gros orteil	big toe
53. pêçiya dirêj	ikinci ayak parmağı	deuxième orteil	second toe
54. pêçiya navîn	ayak orta parmağı	troisième orteil	third toe
55. pêçiya babelîşkê	dördüncü ayak parmağı	quatrième orteil	fourth toe
56. pêçiya qilîşkê	küçük ayak parmağı	petit orteil	little toe
57. neynûka pêçiyê	ayak parmağı tırnağı	ongle de l'orteil	tœnail
58. girêka pê		éminence de l'articulation	ball of the foot
59. gûzika derve	dış aşık çıkıntısı	malléole externe	lateral malleolus
60. gûzika hundir	iç aşık çıkıntısı	malléole interne	medial malleolus
61. piştpe	ayak sırtı	dos de pied	dorsum of the foot
62. hevêsa pê, zengiya pê, kefa pê	ayak tabanı	plante de pied	sole of the foot
63. panî	topuk	talon	heel

KURMANCÎ

Quncika Matematîkê

1) Remo wê ji xwe re bîrek bikola. Roja yekem 2 m. kola. Roja duyem jî 3 m. kola. Gelo, Remo di herdu rojan de çend metre kola?

Bersîv:

2) Binefşê ji dikanê bi 10 kr. firingî, bi 20 kr. tirî û 15 kr. jî îsot kirî. Gelo, Binefşê çiqas pere da dikandar?

Bersîv:

3) Serê salê, bavê Zelal 20 kr, Xalê wê 25 kr û diya wê jî 15 kr dan wê. Gelo, çiqas perê Zelal çêbû?

Bersîv:

4) 35 kronê Zozan hebû. Bi 10 krona şeker û bi 5 krona jî pênûsek ji xwe re kirî. Gelo, çiqas perê Zozan ma?

Bersîv:


VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHĪNIN HEV



EWROPA

Finlanda	Helsinki
Swêd	Stokholm
Norwey	Oslo
Danmark	Kopenhag
Island	Reykjavik
Gronland	
Faroarana	
Britanya Mezin	London
Îngilistan	
Îrlanda Bakur	Belfast
Skotland (Scotland)	Glasgow
Wêls	
Îrland	Dublin
Polonya	Warşova
Çekoslovakya	Prág
Romanya	Bûxarest
Macaristan	Bûdapest
Bulgaristan	Sofya
Yunanistan	Atina
Albanya	Tirana
Yûgoslavya	Belgrad
Otriş	Viyan
Lixtinştayn	
Îtalya	Roma
Malta	Valleta
Sardinya	Kayleri
Korsika	Bastya
Swis	Cenev
Fransa	Paris
Monako	Monte Karlo
Spanya	Madrid
Andora	
Portugal	Lisbon
Almanya Rojhelat	Berlina Rojhelat
Almanya Rojava	Bon
Luksembûrg	
Beljika	Bruksel
Hollanda	Amsterdam

(KURMANCÎ)



HÊŞÎNAHÎ - SEWZÎ


kurdî	tirkî	fransîzî	ingilîzî
bamiye	bamya	gambas	
engînar,			
neynokên bûkê	enginar	artichaut	artichoke
xerdel	hardal	moutarde	mustard
meroje, kiling	kuş konmaz	asperge	asparagus
garis	darî	millet	millet
lazût, gilgilê			
Stembole, garisê			
Stembole.			
genimê şamê, genimok,	mısır	mais	Indian corn, corn
rewas, rûbes	ravent	rhubarbe	rhubarb
îspanax, silqok,			
siyele	îspanak	épinard	spinach
kari, kuvark,			
kumik, fiqerojk,			
karkulîk,			
karok	mantar	champignon	mushroom
tûzik		cresson	watercress
tolik	ebegümeci	mauve	mallow
rihan	fesleğen	basilic	basil
pûng	yarpuz	menthe sauvage	spearmint
kereng	kenger		
nane, pûjan	nane	nane	mint
catiri	kekik	marjolaine	marjoram
sirik	yabani sarmısak	ciboulette	chive
sirim		civette	

KURMANCÎ

QUNCIKA MUZİKÎ

Notenivîs: Zozan Ozmanî

$\text{♩} = 104$ 2 Wer hene



wer he - ne, wer he - ne, he - va - lê.
wer he - ne, wer he - ne, de - la - lê.

2) WER HENE

Wer hene, wer hene, hevalê
Wer hene, wer hene, delalê

Êvara henê ye, hevalê
Êvara henê ye, delalê

Bûk hate hewşê ye, hevalê
Bûk hatê hewşê ye, delalê

Şewtî dîlkê dê ye, hevalê
Şewtî dîlkê dê ye, delalê

Wer hene, wer hene, hevalê
Wer hene, wer hene, delalê

Henê di teşte kin, hevalê
Henê di teşte kin, delalê

Kevçiya avê lêkin, hevalê
Kevçiya avê lêkin, delalê

Li destê zavê kin, hevalê
Li destê zavê kin, hevalê

Li koma dorê kin, hevalê
Li koma dorê kin, delalê

Wer hene, wer hene, hevalê
Wer hene, wer hene, delalê

Hena Diyarbekir, hevalê
Hena Diyarbekir, delalê

Hena şêrîn, şekir, hevalê
Hena şêrîn, şekir, delalê

Wer hene, wer hene, hevalê
Wer hene, wer hene, delalê.

PÊZANÎN

1) Hel- helo,
Bel- belo,
Simêl belo,
Sim- simî,
Dîwar simî.
Ew çi ye?
Bersîv:

2) Zîlî zeman,
Nexşî tûman,
Ne dîn ne îman.
Ew çi ye?
Bersîv:

3) Tişteki min heye tiştanok,
Ber kevirê xiştanok,
Ne gur dixwe, ne jî hirç.
Ew çi ye?
Bersîv:

4) Tişteki min heye,
Canê wî goşt e,
Kincê wî derzî.
Ew çi ye?
Bersîv:

Bersîva mijûliyê

1) Teneka C ji A yê tije bike. Ji C yê bera B de. Ji ya A carek din bera C de û wê jî dîsa bera ser B de. Niha, di teneka A de 4 kg , di ya B de 6 kg û di ya C de 0 kg heye.





2) Ji ya A 3 kg bera C de. Di B de 6 kg hebû. Mirov dikare 1 kg dimsa din ji C bera ser B de. Wê gavê, di C de 2 kg, di B de 7 kg û di A de jî 1 kg dimîne.

3) 7 kg ê di B de mabû bera A de. Di A de berê 1 kg hebû û niha bû 8 kg. Di C de, hîn 2 kg heye.




4) 2 kg ê di C de mabû, bera B de. Ji A jî 3 kg bera C de. Niha di A de 5 kg, di B da 2 kg û di C de 3 kg heye.

5) 3 kg ê di C de heye, bera ser B de û bi vî awayî 5 kg dims di dikeve teneka B. Di ya A jî, berê 5 kg dims mabû.


XAÇEPIRS



NAVÊ VAN HEYWANAN LI BINÊ WAN BINIVÎSIN



MIJŪLĪ



BERSÎVA PÊZANÎNA

1) Qesra spî bê derî.

Ew çi ye?

Bersîv: HÊK

2) Hêstira Qero li bendero,

Ne gur dixwe, ne diz dibe.

Ew çi ye?

Bersîv: QANTIR

3) Tişteki min heye,

Xuşka mine hilgustan,

Çil dergûşê ser destan,

Ne bere û ne bîstan.

Ew çi ye?

Bersîv: MIRÎŞK

4) Pişo pişo nêgizo,


Çû ber ava dengizo,

Ne gur dixwe ne dizo.

Ew çi ye?

Bersîv: PISÎK


BERSİVA XAÇEPIRSAN (42)




**KEREKÎ ME HEBÛ
Û KUNDIREKÎ ME
KERÊ ME
KUNDIRÊ ME KOT KOT

ME JÎ ÇÎROK
Û MESELÊN XWE
YÊN VÊ HEJMARÊ
JI WE RE GOT**

Kulîlk



www.arsivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE -

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 15:- skr
BIHA